

DESTPÊK

Di dîrok û edebîyata kurdan da kêmanendên *Koleksîyona Aleksandre Jabayî ya Destnivîsên Kurdî*¹ hene ku berhemên curbicur yê qadên wekî edebîyat, çand, dîrok, wergernasî, zimannasî û hwd tev tê da hebin. Yan jî mînakeka din tune ye ku berhevkarê koleksîyonê ji bo bidestxistina van destnivîsan xebatên meydanî yê pêwîst bi xwe bike û li gel pispor û zanyarên kurd bixebite. Giringî û feydeyeka din ya vê koleksîyona navborî ew e ku di kêmdarfetîya wê maweya asê da, ev destnivîsên ku ji bo gelek qadên kurdnasîyê heyatî ne, bêyî ku wînda bibin gihîştine ber destê me.

Wekî dihê zanîn berhemên destnivîsî li gor yê çapkirî bêhtir di bin xetere û rîska windabûnê da ne. Zêdekirin û îstînexkirina destnivîsan demeka dirêj digire û ji ber vê yekê nisxeyên wan jî pir ne zêde ne. Di dirêjîya dîrokê da, ev berhemên destnivîs, ji ber sedemên curbicur, pir kêman digihîjin nîfşên li pey xwe. Ev rîska ku li ser mayîndebûna destnivîsan heye, ne ji bo yê kurdan, ji bo yê neteweyên din jî derbasdar e. Lê belê ev rîska ku em li vir behis dikin ji bo destnivîsên kurdan her zêdetir bû.

Em, îro bi têgihîştina xwendin û lêkolînên xwe yê edebî û dîrokî lê hay dibin ku heger kurdan di dîrokê da, wekî neteweyên din proseseka normal bibihuranda, hejmara destnivîsên berdest, dê ji yê neteweyên din ne kêmtir bûya. Em dikarin bi rehetî bibêjin ku di demên borî da li sazgeh û zemînên kurdnasîyê, gelek destnivîsên bi zimanê kurdî hatine îstînexkirin. Hebûna medreseyên kurdan û li van medreseyan jî, zîrekbûna alimên kurd li ser zimanên erebî û farisî, ev medrese kirine gencîneyên destnivîsan. Herweha em dizanin ku di pirtûkxaneyên beg û mîran da jî gelek berhemên destnivîsî hebûn. Gotinên Katîb Çelebîyî, di vê mijarê da balkêş û têrker in.

¹ Derbarê vê koleksîyonê da ji bo agahîyên berfireh bnr: Mustafa Öztürk (2017), *Koleksîyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan)*, Weşanên Lîs, Dîyarbekir.

Li gor Katîb Çelebîyî (1609-1657), piştî sedsala 16em ji nava dewletên di bin bandora osmanîyan da, tenê li dewleta kurdan felsefê û zanistên siruştî dihatin hînkirin. Di wê serdemê da (1576) bo mînak, di Medreseya Kahbanê ya li Amedîyê, di bin rêvebirîya begê Behdînanê yê bi navê Siltan Hisênî da du hezar destnivîs hebûn. Evdal Xanê Begê Bedlîsê (1655) jî ji wî bêhtir xwedî destnivîs bû.²

Agahîyên weha nîşanî me didin ku hilberandina berhemên destnivîsî, di dîroka kurdan da her hebûn, lê ji ber sedemên cuda, hejmara van destnivîsên berdest gelekî kêmtir in. Yê ku gihîştine ber destê me jî, xweşbextane bi tevkarîya kesayetên wekî Aleksandre Jabayî pêk hatine. Mînakeka herî şênber û berbiçav ya vê angaştê, bêguman ew berhem e ku bûye mijara vê xebatê. *Rîsaleyî Tûhîfetu'l-Xîlân Fî Zîmanê Kurdan* (Dîyarîya Dostan di Zîmanê Kurdan da), ku di koleksiyona A. Jabayî da bi hejmara KURD 8an cih digire, li gor agahîyên heta niha nisxeyeka “unîk” e; anku kopîyeka wê tenê heye û ew jî di nava vê koleksiyonê da ye. Ji vê yekê jî dîyar dibe ku heger ne ev hewilên A. Jabayî bûna belkî me nedikarî ev berhema ku derbarê zimannasîya kurdî da ewqas heyatî ye, bi dest bixista.

A. Jabayî gelek zîmanan bi qasî pisporên wan zîmanan baş dizanî. A. Jabayî ku bi rûsî, fransî, almanî û tirkî pir baş dizanî, demeka dirêj li herêmên kurdan dimîne û ji Mela Mehmûdê Bazîdîyî, ku di nameyên xwe yê şexsî da wekî “mamoste” behis kirîye, di asteka berz da hînkurancîyê bûye. Asta kurancîyê xwe di nameyeka xwe da ku ji Dornê rojhilatnas ra dişîne, bi vê gotina xwe derdibire: “*Hingî min kurancî xwend û gihîştim asteka wisa, êdî dikarim bi Kurancî bixebitim û dikarim wergêrîyê bikim.*”³ Mela Mehmûdê Bazîdîyî, wekî mamosteyê A. Jabayî, weha dihê famkirin ku di hewila hînkirina kurancîyê da ev berhem wekî materyaleka sereke bi kar anîye. Jixwe di pêşîya berhemê da jî nîşan dide ku wî ev berhem yekser jî bo A. Jabayî nivîsîye û herweha behisa danîna navê berhemê jî bi vî awayî dîke:

² M. Malmisanîj, “Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine - II”, *Tarih ve Toplum*, Hj: 55, 1988, r. 58.

³ Mustafa Öztürk (2017), *Koleksiyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, Vekolîn û Saloxdan, Weşanên Lîs, Dîyarbekir, r. 12.

Tu bizanî ku sebebê pêkêxistina vê rîsâlê ew e ku me di gel konsolê dewleta fexîme ya Rûsya, ku sâkin e li Erzîrûmê, Mîr Jaba ji mêj dostî û nâsî hebû û ewî jî qewî zêde meyla zanîna zimanê kurmancan dikir. Îcarê me jî mirad kir ku em jî rîsâleyekê di behîsa wî zimanî da pêk bixînin; êdî me dest pê kir û navê rîsâlê jî Tûhfetu'l-Xîlân Fî Zimanê Kurdan, hate danîn. Xudê temâmkirinê jê rast bîne. Âmîn.⁴

Wekî ji hevkarîya vê berhemê jî xuya dibe, tu lêkolerên ku derheqê Mela Mehmûdê Bazîdîyî da xebitîne, nabe ku behisa dîplomatê rûs û lêkoler Aleksandre Jabayî nekin. Lewra rastîyeka zelal heye ku hema bibêje di hemû xebatên Bazîdîyî da, A. Jabayî rê li ber wî vekirîye û wêrekî daye wî. Li gel vê yekê, li ser xebatên ku A. Jabayî di warê çand, ziman û edebîyata kurdî da kirine, tesîra Bazîdîyî jî bi awayekî çêbûye.

Mela Mehmûdê Bazîdî di warê hebûna ziman, edebîyat û çanda kurdî da şexsîyetekî giranbiha ye. Lê giringîya Mela Mehmûdê Bazîdîyî yê zana û xwedî şexsîyetekî piralî ku di gelek warên çanda kurdî da xebitîye, ancax piştî zêdeyî sedsal û nîvekê hatîye famkirin. Herweha em îro ji fikirên Bazîdîyî yên li ser perwerdehîya kurdî ya medreseyan jî haydar in û em dibînin ku wî ji bo pirtûka rêzimanê ya Elî Teremaxîyî pêşgotineka hêja nivîsîye. Kadrî Yildirimî di xebata xwe ya li ser medreseyan da cih daye vê pêşgotinê ku Bazîdîyî li pirtûka rêzimanê ya Elî Teremaxîyî zêde kirîye. Bazîdî di vê pêşgotinê da behis dike ku xwendekarên kurdan ji ber perwerdehîya bi erebîyê zehmetî dikişandin û loma jî Elî Teremaxîyî bi kurmançîyê pirtûk amade kirîye. Em beşek ji vê pêşgotinê bidin dê baştir bihê famkirin:

Me'lûmê te bibit ku telebe û fuqehayêd Ekradan heta tarîxa hezarî ilmê serfê ji kitêbêd Erebiyyu'l-îbare weku kitêba Se'dudînê Teftazanî ku "Se'dînî" dibêjîn û ji "Çarperdî"yê û ji "Se'dulah Gewre", ji van emsalê kitêban îstînbat û îxrac dikirin û îxraca ji kitêbêd 'Erebiyye jî zaf dijwar dibûye ... Paşê di tarîxa hezarî bi şû ve ji qedayêd Hekariyan di qeda Muksê da gundek heye Teremax dibêjîn. Ji wî gundî navê Elî mirovekî xwuyê ze'n û îdrak û sahibhoş û fetanet peyda bûyî, teleba ilm û funûnêd bedî'e kirî... Weku dîtiye û muşahede kirîne ku ilmê serfê fenekî zehmet û dijwar û asê ye û mubtedî zû bi zû sîxe û î'lalêd wan ji kitêbêd Erebiyye îxrac nakin; ji boy mubtedîyan bi zimanê kurmancan 'îbaretekî tesrîfê tesnîf kiriye

⁴ Mela Mehmûdê Bazîdî, *Tûhfetu'l-Xîlân Fî Zimanê Kurdan, Koleksîyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, Kurd 8, wr. 2.

*ku ew îbaret di nîva telebêd Ekradan qewî meqbûl û ehem û lazim e elbete ...*⁵

Eger em bihên ser xebata Bazîdîyî “Rîsaleyî Tûhîfetu’l-Xîlân Fî Zimanê Kurdan”ê û em li naveroka wê binêrin, em dibînin ku sê beşên sereke tê da hene. Bazîdî, di beşa yekem da bi giranî behisa rêzikên rêzimana kurmancîyê dike. Ev beş, di nava beşan da ya herî berfireh e û ji rûpela (3b)yê heta rûpela (77b)yê, 74 rûpel in. Lê di vê beşê da behisa hinek taybetmendîyên fonolojî û semantîka kurmancîyê jî dike. Bi giştî mirov dikare vê beşê bike sê binbeş. Ew binbeş; lêker, navdêr û herf in.

Di beşa duyem da, Bazîdîyî ferhengoka lêker û navdêran çêkirîye ku bi kurmancî û tirkîyê ye. Di vê beşê da du binbeşên sereke hene ku yek, lîsteya lêkerên hevmane û pirmane ye û ya din jî lîsteya navdêrên hevmane ye. Yanî, sê lîsteyên lêker û navdêran di vê beşê da hene. Ev beş ji rûpela (77b)yê heta (127b)yê ye û 50 rûpel e.

Beşa sêyem ya vê pirtûkê jî dîyalog in ku di forma pirs û bersivan da ye. Bazîdî, di serê vê beşê da dîyar dike ku ev dîyalog pêveka (zeyl) vê pirtûkê ye (127b). Beşa herî biçûk ya berhema wî ev beş e ku ji rûpelê (127b)yê heta (144b)yê ye û 17 rûpel in. Pirs û bersiv ji meseleyên rojane û hêsan dest pê dikin û her ku diçe zimanê wê û mijar girantir dibin.

Herçend bi awayekî giştî mirov dikare vê xebatê bi awayê li jor li ser sê beş û hinek binbeşan dabeş bike jî, dema ku em li gor mijarên ku Bazîdî li ser sekinîye dabeş bikin, dê baştir bibe. Wê demê, hem dewlemendîya mijarên ku Bazîdî li ser sekinîye dê baştir bihê dîtin hem jî nirxandina wan ya li gor rêzimana nûjen baştir bihê kirin.

⁵ Kadri Yıldırım (2018), *Kürt Medreseleleri ve Alimleri*, C. 1, Avesta Yayınları, İstanbul, r. 69.

